Schulamt für den
Kreis Gütersloh

**Pêvajoya li gorî rêziknameya di derbarê piştgiriya pedagojiya**
**Taybet, dersên li malê û dibistana ji bo nexweşan (AO-SF)**
Agahî di derbarê pêşveçûna pêvajoyê de, ku ji bo zarokê we pêk were

,Malbata Rêzdar

Ji bo zarokê we dê di demeke nêz de pêvajo destpê bike. Lewra em ê binêrên, ka ji bo zarok piştgiriya taybet ya pedagojîk lazim e. Saziya Dibistanê ya Navçeya Gütersloh wekî Saziya Berpirsyariya Dibistanan vê pêvajoyê bi rê ve dibe.

**Kurteagahiyên di derbarê pêvajoyê de:**

Du mamoste dê bi hev re raporekê di derbarê zarokê we de binivîsin. Ji bo vê yekê pêdiviya .1
mamosteyan bi alîkariya we heye. Her du mamoste dê we dawet bikin ji bo axaftinê û ew ê di derbarê pêvajoyê de agahî bidin we. Ji kerema xwe re dîtin û serpêhatiyên xwe yên di derbarê zarokê xwe de ji mamosteyan re bibêjin. Eger doktor agahiyên nivîskî yan jî devkî di derbarê zarokê we de bi we re parve kiribin, ji kerema xwe re van agahiyan jî bidin mamosteyan. Em ê bi awayekî pêbawer nîzîkî gotinên we bibin.

Kontrola tibî ya dibistanî ji bo zarokê we, wekî her zarokî, hatiye kirin yan jî dê bê kirin. .2
Gava kontrolên din yên dibî ji bo pêvajoyê pêwîst bin, ew ê pêk werin. Em ê di derbarê vê de agahî bidin we.

Mamoste di derbarê zarokê we de dê raporekî binivîsin û ew ê vê raporê di axaftineke şexsî .3
de ji wer e vebêjin. Em ê agahî bidin we, ka zarokê we dikare here kîjan dibistanên bi fêrbûna bi hev re yan jî kîjan dibistanên piştgirtî. Hûn dikarin di derbarê vê de daxwaza xwe bibêjin.

Mamosteyên peywirdar rapora xwe bi tevahiya dosyeyan pêşkêşî Saziya Dibistanê dikin, ku .4
biryar were girtin. Saziya Dibistanê dikare raporên din jî bixwaze.

Saziya Dibistanê piştî ku tevahiya dosyeyan dîtin, ew ê biryar bide, kapêdivî bi kîjan piştgiriya .5
pedagojiya taybet heye û ew dikare li kîjan dibistanê herî zêde piştgirî bide zarokê we. Eger hûn bixwazin, hûn dikarin şexsî bi teftîşiya dibistanê re biaxivin. Ji bilî vê axaftinê hûn dikarin her dem bi mamosteyan re di derbarê piştgirya zarokê xwe ya siberojê de biaxivin.

Saziya Dibistanê dê biryara xwe ya di derbarê pêşniyara dibistana bo zarokê we bi sedeman .6
re bi awayekî nivîskî bide. Eger zarokê we ji xwe li vê dibistanê ne qeydkirî be, ji kerema xwe re qeydiya wî li vê dibistanê çêkin.

Hûn ji zarokê xwe re dibin alîkar, gava hûn werin tevahiya hevdîtinên bo axaftinê.

Em dixwazin, ku rewşa zarokê we di dibistanê de baş be, ji ver vê yekê ji bo biryardanê dem ji me re lazim e. Ji ber vê yekê ji keremea xwe hinek sebir bikin!

Li gel silavên germ